# Kurdistan

PDK-S Partiya Demokrata Kurdistan - Sûriya 1957

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

Nîsan / 1 - 4 - 2022 Kurdistan-Hejmar (218) www.pdk-s.com


# Buhabûna kelûpelên sereke li Kurdistana Sûriyê rewşa welatiyan zehmetir kiriye

Kurdistan **Imran Xelef**



**Di vê dema dawî de û di jêr hincetên cuda de, kelûpelên sereke yê rojane li Kurdistana Sûriyê buha bûne û ji wan jî zeyta xwarinê û şekir û hin madeyên din, û ev yek jî bûye bargiraniyeke mezin ji bo welatiyan. Hejmareke welatî nerîna xwe di vê derbarê de tînin ziman. Welatiyê bi navê Ehmed Omer wiha dibêje, raste li gelek welatan madeyên sereke buhabûne, lê li cem e du qat buhabûne, û bazirgan istixlala bazarê û welatiyan dikin û nirxê kelûpelan buha dikin. Mihemed Osman jî wiha dibêje, hejmareke ji bazirganên ku ser bi rêveberiya PYD ve hemû bazar xistine jêr kontrola xwe de, û nahêlin ti kes ji xeynî wan kelûpelan bifroşin.Herwiha di kogehên xwe de bi tonan made veşartine da ku bi buhayî bifroşin xelkê û bi vê yekê rewşa xelkê Kurdistana Sûriyê zehmetir bûye, û ew nikarin van madeyan bi nirxê buha bikirin.**

# Destûrekî şofînî ji bo Sûriyê nayê qebûlkirin

Kurdistan- Soz Xelîl

Di 25ê Adarê de, karên heftemîn gera civînên Komîteya Destûrê Sûriyê li bajarê Cinêv yê Siwîsrayê li gor karnameya ku jê re hatibû danîn, û bi amadebûna her sê aliyên beşdar di komîteyê de û di jêr çavdêriya Neteweyên Yekgirtî bidawî hat.
Di dema çar rojên vê gerê de, dariştinên çar pransîpên destûrî hatin gotûbêjkirin ku ew jî ev in: "Pransîpên sereke di desthilatê de", ku ji aliyê nûnerên Desteya Danûstandkara Sûriyê ve hate pêşkêşkirin, û "Nasnameya Dewletê" ku ji aliyê endamên şanda Civaka Sivîl hate pêşkêşkirin, û "Sembolên Dewletê", şanda rejîma Sûriyê pêşkêş kir, herwiha "Rêkxistin û karê desthilatên giştî" ji aliyê şanda Desteya Danûstandkara Sûriyê ve hate pêşkêşkirin.
Di roja dawî ya civînê de, Nûnerê Kurd Kamîran Haco axaftinek derbarê nasnameya Sûriyê pêşkêş kir û têde nerîna pêkhateyan di vê derbarê de nîşan da, û ew kaxez wek yadaştekê radestî aliyên peywendîdar hate kirin.
Di dema gera heftemîn de, Şanderê Taybetê Neteweyên Yekgirtî bo Sûriyê Gier Pedersen li pêş endamên Encumena Asayişa Navdewletî ragihand ku nakokiyên mezin di navbera herdu şandeyên hikûmet û opozisyona Sûriyê de hene. Pedersen bang li herdu aliyan kir ku hewlên cidî bidin ji bo dîtina bingeheke hevbeş ji bo cîbicîkirina biryara 2254. Li gor ku Şanderê Taybetê Neteweyên Yekgirtî bo Sûriyê Gier Pedersen li pêş Encumena Asayişa Navdewletî ragehnad dê gerên bê yên Komîteya Destûr di mehên Gulan û Hezîranê de birêve biçin.
Parêzerk ji Rojnameya Kurdistan re dibêje, raste rêjeya Kurdan di nava Komîteya Destûr de kêm e, lê divê piştevaniya nûnerê Kurd were kirin, ya herî giring ew e ku mafê Kurd û pêkhateyên din di nava destêrê bê yê Sûriyê de were çespandin ji ber ku destûr parêzerê mafên pêkhateyan dibe û di nava wan de Kurd, hin alî dixwazin pirsên girêdayî mafê pêkhateyan were lipaşxistin, lê ev yek dê di pêşerojê de zirarê bighîne pêkhateyan.Di baweriya min de karê komîteyê bi sistî birêve diçe, û rejîma Sûriyê û civaka sivîl ya ser bi wê ve hewil didin astengiyan der bixînin, ew dixwazin demê derbas bikin, û bi rastî jî ev yek rû dide. Di civîna dawî de rejîma bi pêşkêşkirina pirsên girêdayî nasname û al û zimanê fermî û navê dewletê dixwest nakokiyan bixe nava opozîsyonê û pêkhateyan de.

Komîteya Destûr:

Di 23ê Îlona sala 2019an de, Neteweyên Yekgirtî gihiştina bi rêkeftinekê di navbera Hikûmeta Sûriyê û Desteya Danûstandkara Sûriyê derbarê avakirina komîteyeke destûrî ya hevseng û giştî ragehand, ku ji nûnerên hikûmet û opozîsyonê û civaka sivîl pêk tê, ji bo gengeşekirin û amadekirina reşnivîsa destûreke nû yan çakirina destûrî, di çarçoveya arsateya çareseriya siyasî li gor beyanameya Cinêvê, û piştgirêdan bi biryara navdewletî 2254 ya ku di sala 2015an hatiye derkirin. Komîteya Destûrê Sûriyê ji 150 endaman pêk tê ji her sê aliyan, Komîteya biçûk ji 45 endaman pêk tê ku ji her aliyekî 15 endam di nava vê komîteyê de hene, Komîteya biçûk li Cinêvê dicive û yekm civîn jî di meha Çirya Pêşîn sala 2019an hate encamdan.





# Siwarên şevê
# (Ji Zêrîn a keça Sebrî Fexrî re)

Bêwar Brahîm

Zêrîn, wê şeva tund û dirinde jibîr bike, û mijgulên çavên xwe yî nermîn bi xewnên zaroktiya xwe bixemilîne. Ew şeva ne rengê şevên me bû, ew şeveka revyayî bû ji şikeftên xatirxwestina nêzîk û ne dûr.
Buharên me bi şevên xemlîn û hunguvîn dagirtîne, bi heyvên çarde şevî ronîkirîne, li benda berbanga wan şevan be berxka bavê xwe û pala xwe bi çenteyê xwendina xwe yî ronak germ bike û hûrik hûrik wê şeva taristan jibîr bike.
şeva girtina bavê xwe bi ken û girnijîna xweyî nermîn li ser kevîkên vê jiyanê bike hêviyeka bi hêz çendî ev hêvî basikçikestî û lukumî be jî wê ji ser dêmê şev û rojên xwe nemalîne
Zêrîn, li ber sira bayê porê te yî bi hilma azadiyê dagirtî di nav xwe de difûrîne mistên her du destên xwe bi xaka gorbuhiştiyên bapîrên xwe dagire û bi sira vî bayê re bibarîne.
bila hesr kes zanibe ku bapîrên te bi girtina bavê te serbilindin, bila her kes zanibe ku mihmed ê Fexrî û Mehmûdê Fexrî û Sebriyê Fexrî zindîne ne mirîne û di gorên xwe de çavdêrên pêvajoya xewna me yî ezelîne û li benda refên mizgîniyên me ne.
Zêrîn, girtîgeh ne cihê bavê teye, bê çawa ne cihê bapîrên te bû, lê jibîr neke her armancek û baca wê heye û baca xewdiyên doza serxwebûn û azadiya Kurdistanê an kuştine an girtine û em Kurd li her çar perçeyên Kurdistanê ji vê bacê ne bê parin.
Susretmabûna ku em xwe jê diparêzin ji nişkave êrîşî me dike û çingîniyê ji bin guhê pêvajoya me tîne da em hinekî li xwe şiyar û hay bin, da em yeqîn bikin ku berxên doh îr bûne gur û gur bûne hirç û em di nav penc û diranên wan de bûne adrdik.
Zêrîn, bi hezarên salan buharên şoreşên me li darin, bi hezarên salan ev şoreş li nav deryayên xwîn û hêsran noq bûne lê serhişkiya doza serxwebûn û azadiyê sal bi sal xwe ji vê noqbûnê felat dikin di her felateka xwe de ev şoreş germtir û bi hêztir dibin û mîna teyrê Sîmir her ku dişiwete ji nû ve vedije û ber bi jiyaneka nû ve di sênga asman de vêdikeve.
Raste gelek cûreyên vê jiyanê sexte bûne, lê rastiya rastîn ti caran serê xwe ji sextekariyê re natewîne û na çemîne, rastiya ku ew ê rojekê ji rojan zora her derew û sextekariyan bibe û dîwarên zindanên pênûsan û yên ramanên azad û yên berxwedêr wê biherifînin.
Zêrîn, ji verendeya zaroktiya ku çav li derketina çola nûroja me bû te nerînên xwe bi bê bedngî pelandin , lê dilê te qêmîşî derketina wê çolê ne bû û tu ma girtiya rêka bendemayina vegera bavê xwe da tu û wî bi hev re nûrûj bibin.
Xeman nexwe kulîlka bav û apê xwe, ev nûrûja ku te xwestî derengmayî namîne wê bê û tê desmalkên bixêrhatina rengîn li pêşberî wî li ba bike û mîna karxezalan tê xwe bavêje himbêza wî, hingê ew ê porê te mist bide û te dilinya bike û bêje:
Ne tirse keça min, ez di nav destên ewle de bûm, ez di zindanên Kurd de bûm û zindançiyên min jî Kurd bûn û çendî em dijberiya hev bikin û hevdu riswa bikin û bi nerînên ciyawaz pêvajoya xwe berdewam bikin em Kurd in û em ê her Kurd bimînin.



Zêrîn ligel mamê xwe Dr. Lezgîn Fexrî



# Nîzar Mûsa, Baştirîn mamosteyê penaber li ser asta Ewropa

Kurdistan

Navendeke lêkolînê ya Emerîkî INEE ku navenda wê li Newyorkê ye, û bi hevkarî ligel zanîngeha Viyêna hejmareke hevdîtin ligel hejmarek kandîd kirin ku penaber bûne û li gor pransîpên perwerdeyê Endezyarê Kurd Nîzar Mûsa û mamsoteyeke Ukranî wek baştirîn mamsoteyên sala 2022an li ser asta Ewropayê hatin hilbijartin. Nîzar Mûsa, xelkê gundê Mistefawiyê ser bi Girkêlegê li Kurdistana Sûriyê ye, jidayikbûyê sala 1984an û ev 8 sal in li Nêmsa bajarê Viyêna dijî, û hilgirê bawernameya Endezyariya Çandniyê ye.Nîzar Mûsa wek mamosteyê zîndewernasî li dibistaneke Hikûmî li Viyêna ji berya sê salan ve kar dike, Nîzar di heman warî de li dibistanên Girkêlegê li Kurdistana Sûriyê kar dikir. Niha ji li Viyêna piştî bidawîanîna geşepêdana perwerdeyî ji zanîngeha Viyêna li dibistanên wî bajarî kar dike. Nîzar Mûsa ji Rojnameya Kurdistan re wiha dibêje: Ez û mamosteyke Ukranî wek baştirîn mamosteyên sala 2022an li ser asta Ewropa hatin hilbijartin li gor raporteke navenda lêkolînê ya Emerîkî, ku wê raportê ronahî xistibû ser bicihkirina pransîpên perwerdeyê û bi awayekî xwebexş li Navenda Çandî û Civakî ya Kurdî li Viyêna ya ku me di sala 2016an de damezirand ji bo xizmetkirina revenda Kurd di warê Zimanê Elmanî û pêşkêşkirina xizmetguzariyan ji bo penaberên Kurd û Sûrî bi giştî, û tişta ku ez bêhtir kêfxweş kirim ku ew lêkolîn hin wêneyên min hilbijartine dema ez li ser karê xwe bûme li navendê, herwiha ligel hebûna Ala Kurdistanê, wek rêzgirtin ji karîn û keda me re li rêveberiya navendê û erkê me di xizmetkirina revenda Kurd e. Nîzar Mûsa wiha berdewam dike, û dibêje: Ew zehmetiyên ku li Nêmsa rastî min hatine fêrbûna Zimanê Elmanî, herwiha rijdbûna min li ser fêrbûna vî zimanî di demeke kurt de û fêmkirina sîstema perwerdeyê ya Ewropî, ev yek jibilî girêdana min bi hejmareke kar û çalakiyên din. Ya herî giring di vê demê de ez avakirina xwe ya perwerdeyî temam bikim, herwiha piştevaniya Kurdistaniyên li Ewropa dijîn bikim.



## Cemal Sedûn di bîra her Kurdperwerekî de ye

Kurdistan

8 sal bi ser koça dawî ya Hunermendê netewî Cemal Sedûn re derbas dibin ku dengê wî li ser asta Kurdistana Sûriyê naskirî bû.

Cemal Sedûn:
Di sala 1958an li bajarê Dêrikê yê Kurdistana Sûriyê li nava malbateke hejar û Kurdperwer jidayik bûye, û ji zaroktiya xwe de dest bi hunerê kiriye, dengê wî li nava Dêrik û deverên din yên Kurdistana Sûriyê belav bibû. Cemal Sedûn kesayetiyeke nêzîkî miletê xwe bûye, û di temanê ciwaniya xwe de tevlî rêzên Partiya Demokrata Kurdistan- Sûriya bû, û wî hejmareke zêde ya stranên netewî gotine û bi taybet li ser Barzaniyê Nemir û ji bo vê yekê jî rastî gelek astengiyan ji aliyê rejîma Beis ve dihat û çend caran hatiye girtin û eşkencekirin. Hunermend Cemal Sedûn yek ji qurbaniyên serjimêriya sala 1962an û ji nasnameya Sûriyê bêpar bû. Cemal Sedûn li ser rêya penaberiyê di 302014-03-an de jiyana xwe jidestda, koça wî bandoreke mezin li hezkiriyên wî kir ji ber ku Sedûn kêf û xweşî dixiste nava dilê miletê xwe çi li nava şahî yan jî li Newrozan.



## Ez Jîn im



Kemal El-Sîno

Nebêj e min tu kiye ?
Ku nebim ez jîn niye
Rok im ez
Geş stêr im
Qad û heyv
Li dora min diger in
Rok im ez
Ku ez hiltêm
Govenda jînê diger e
Baran im ez
Xweşiya her kesî me
Heyv û stêr im
Bo demê nasname me
Çîçek im ez
Şîrava min hingiv e
Gul im ez
Bihna xweşiya te me
Dayik im ez
Neh heyvam te hilandî
Ta mirinê
Ji te re fîdakarî
Dapîr im ez
Çîroka her demê me
Xwişka te me
Bihna dayik û bav im
Kiç im ez
Hêviya her lawa me
Hevjîn im ez
Stûna her mala me
Mindal im ez
Gula hemî mala me
Nevî me ez
Şêrîna ber dila me
Rast e mê me
Lê ez Şêr im
Û Şêr tim padîşah e
Rast e mê me
Jîn û jiyan
Vîn û viyan
Cîhan û beheşt
Tev mê ne
Ez cîhan im
Herkes bo min şer dike
Ez beheşt im
Her kes bo min kar dike
Jîn ji min e
Û jîn li min vedger e

